# GOTINÊN NAVDARAN

Amadekar: **Firat Ceweri**



NÛDEM

# GOTINÊN NAVDARAN

**Amadekar û werger: Firat Ceweri̇̂**

**Aforisma**

Weşanên NÛDEM

Weşanên NÛDEM: 10
Gotinên Navdaran
Çapa yekem : Stockholm 1995

© Weşanên NÛDEM
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: NÛDEM
ISBN: 91-88592-09 X

Navnîşan:
Termov. 52. 2 tr.
175 77 Järfälla-Sweden
Tel û Fax: 8-58356468

Ji birayê min M. Elî (Birûsk) re ku di 19'ê Tebaxa 1994'an de li Kurdistanê, li ber dikana xwe bû hedefa gulleyên hovan û di 20'ê Tebaxê de li Diyarbekrê wefat kir.

**F. Cewerî**

Kal û pîr ji her tiştî bawer dikin; navsal ji her tiştî bi şik in; ciwan jî bi her tiştî dizanin.

*Oscar Wilde*

*

Pîrîtî tenêtî ye.

*Eflatun*

*

Pênûs zimanê êqil e.

*Cervantes*

*

Berî ez kal bibim min jiyaneke baş dixwest, piştî ez kal bûm jî ez mirineke baş dixwazim.

*Seneca*

*

Nivîskarê ku hûn dixwînin, mîna ku hûn ji xwe re hevalekî dineqînin, wilo bineqînin.

*Wentworth Dillon*

*

Li dilê xwe binihêre û wilo binivîsîne.

*Sir Philip Sidney*

*

Zanîn, çavkaniya başnivîsandinê ye.

*Horatius*

*

Ger hûn dixwazin bibin nivîskar, binivîsin.

*Epiktetos*

*

Yên li jêr ji ketinê natirsin.

*Bunyan*

*

Agir zêr, xizanî jî mirovên mêrxas diceribîne.

*Seneca*

*

Yên herî xizan, peyayên dîrokê yên herî mezin in.

*Emerson*

*

Ji bo ku ez xwe bi tenê nebînim, ez hemû şevê li hemberî neynikê rûniştim.

*Cesare Pavese*

*

Ez di nava wan de bûm, lê ez ne ji wan bûm.

*Lord Byron*

*

Mirovê herî bi tenê, mirovê herî bi hêz e.

*H.Ibsen*

*

Şaşî di kulika mişkan de jî derbas dibe; lê rastî di deriyan de hilnayê.

*H.W. Shaw*

*

Pejirandina şaşiyekê, bidestxistina serfiraziyekê ye.

*C. L. Gascoinge*

*

Tiştê ku tu rast dibînî bike; te divê bila dinya xerab bibe.

*Herbert*

*

Mirov çi bixwaze dikare bike.

*Montaigne*

*

Berî tu dest pê bikî baş bifikire, lê ku te dest pê kir jî zû dawî bîne.

*Sallust*

*

Kirinên mirovan ji Xwedê ve xuya ne.

*Ovidius*

*

Temen jî mîna evînê ye, nayê veşartin.

*Thomas Dekker*

*

Qermîçok ne di dilê mirov de, di eniya mirov de çêdibin. Ji ber ku ruh qet pîr nabe.

*J.A.Garfield*

*

Ger hêvî nemîne zewqa jiyanê jî namîne.

*Emile Zola*

*

Hêvî nîvê cesaretê ye.

*Balzac*

*

Ji bo yên dijîn hêvî, ji bo miriyan jî bêhêvîtî heye.

*Theokritos*

*

Şerm xemla ciwanan, rûreşiya kal û pîran e.

*Aristo*

*

Ger navdarî piştî mirinê were, ji bo ku ez navdar bibim qet leza min tune.

*Martial*

*

Dil li ku be, welatheziya rastî jî li wir e.

*Berkeley*

*

Em ji welatê xwe hez bikin, ew welatê bavê me ye jî.

*Schiller*

*

Li diranên hespa ku diyarî tête dayin nayê nihêrîn.

*St.Jerome*

*

Yê ku carekê derewan bike, dikare careke din jî bike.

*Henry Fielding*

*

Tu tişt mîna derewan mirovan biçûk nake.

*A. Çexov*

*

Mirovên derewîn pir sondan dixwin.

*Alfieri*

*

Derewîn, rastiyê jî bibêje kes jê bawer nake.

*Cicero*

*

Dîroka mirovatiyê, dîroka fikrê ye.

*H. G. Wells*

*

Peyayên mezin dîrok, dîrokê jî kirinên peyayên mezin xemilandiye.

*La Bruyère*

*

Biaqil li ser sedeman munaqeşe dikin, kêmaqil jî biryaran didin.

*Anarchasis*

*

Ger ev netewe nîvî azad û nîvî jî dîl be, ew najî.

*Lincoln*

*

Yên ku ji bo parastina mafên belengazan nepeyivin, ew dîl (hêsîr) in.

*Lowell*

*

Zincîra ku hûn dixin stûyê dîlekî, seriyê wê yê din dikeve stûyê we.

*Emerson*

*

Hêvî gopalê dildaran e.

*Shakespeare*

*

Hêvî tunebûya, jiyan jî çênedibû.

*Holderling*

*

Hêvî, nanê belengazan e.

*Thales*

*

Hêvî, xewneke ku mirovan hişyar dike.

*Aristo*

*

Ger hêvî ji dest biçe, tirs jî diçe.

*Milton*

*

Ji berdêla şerefa min bimire, ez bimirim çêtir e.

Addison

*

Şeref ji bo peyayên bi rûmet, ji jiyanê jî bi qîmettir e.

*Shakespeare*

*

Du navên şeytên hene: Yek jê şeytan e, yê din jî derew e.

*Victor Hugo*

*

Şeytan di dûjehê de qiraljinek e.

*Owen Mededith*

*

Cihê ku şeytan tê re derbas dibe, jin jî dikarin tê re derbas bibin.

*Prosper Mèrimè*

*

Evîn, segan jî bi kafiye direyine.

*John Fletcher*

*

Helbest şeraba şeytên e.

*St. Augustine*

*

Helbestkarên nû, pir avê tevlî hubura xwe dikin.

*Balzac*

*

Ferqa helbestê ji ya dûznivîsê ev e; bi hindik gotin, gotina pir tiştan e.

*Voltaire*

*

Helbestkarê ez herî pirr jê hez dikim, yê ku bi xwe jî dizane ku helbestnivîsandin jê nayê, lê dîsan jî dinivîsîne.

*Baraccio*

*

Helbest, hevalê tenêtiyê ye.

*Cervantes*

*

Pirskirin, li mirovên biaqil nayê.

*Samuel Johnson*

*

Pirsa ku yên biqail nikarin di heft salan de bibersivînin, gêjik di rojekê de dipirsin.

*Gotineke Ingilizan*

*

Ji min pirsan nepirse, da ez jî derewan nekim.

*Goldsmith*

*

Yên ku sozên giran bidin, karên bi lez dikin.

*Rousseau*

*

Ji bo karên ku tu nikarî bikî, ji kesî re sozan mede.

*Washington*

*

Ez kirina metreyek kar, bi sozdayîna kîlometreyan ve naguherim.

*James Howel*

*

Sûcên herî mezin ne ji bo tiştên pêwîst, lê ji bo bidestxistina tiştên zêde têne kirin.

*Aristoteles*

*

Civak sûc amade dike, sûcdar jî dike.

*Buckle*

*

Ji berdêla ku wê şerefa min bişikê, ez hezar carî bimirim, çêtir e.

*Addison*

*

Yê ku şerefa xwe winda bike, tiştekî din ku ew winda bike, namîne.

*P. Syrus*

*

Heya ku mirov evîneke nû peyda neke, mirov demeke dirêj bi evîna kevin ve girêdayî dimîne.

*La Rochefoucauld*

*

Ji hezkirina bêî ku mirov bête hezkirin xerabtir tiştek tuneye.

*Turgenyev*

*

Hezkirina ku bi parve dibe, qels e.

*Voltaire*

*

Sir nayê veşartin.

*L. Fontane*

*

Mêr ji sirên xwe bêtir, yên hevalên xwe vedişêrin; jin jî berevajiya wê dikin, sirên xwe baş vedişêrin.

*La Bruyère*

*

Siyasetvanek li hilbijartina dahatû, peyayekî dewletê jî li nivşê dahatû difikire.

*James F. Clarke*

*

Siyaset karekî zehmet e, yê ku bi dilê xwe dikeviyê, divê gazinan neke.

*G. Grass*

*

Yên ku siyasetê û exlaq ji hev vediqetînin, tê wê maneyê ku ew ji herdiwan jî fêhm nakin.

*John Morley*

*

Ji bo ku mirov bipirse, divê mirov berê hîn bibe.

*Goethe*

*

Her pirs ne layiqê bersivdayinê ye.

*Syrus*

*

Huner keştî û tirimpêlan dimeşîne, evîndariyê ava dike. Dijminê hunerê nezanî ye.

*Ben Jonson*

*

Vexwarina avê, ne mirov nexweş û deyndar dike, ne jî jina mirov jinebî dihêle.

*John Neale*

*

Dîroka serxweşiyê, ji dîroka doktoriyê kevintir e.

*Rabelias*

*

Yên ku bi şer nizanibin, aştiyê jî nas nakin.

*Gotineke Japoniyan*

*

Aştiyek nebaş, ji şer jî xerabtir e.

*Tacilus*

*

Şer ilmê mehûkirinê ye.

*John S. C. Abbott*

*

Mirovên şerker, kelehên bajarekî ne.

*Alcaeus*

*

Ceng lawê dûjehê ye.

*Shakespeare*

*

Peya ji bo şer hatine afirandin, jin jî ji bo bêhnberdana şerkeran e.

*Andre Maurois*

*

Hemû bûyer ji sedemekê dertên.

*Giordano Bruno*

*

Li hemberî nexweşiyê rabin. Ji kesî re behsa nexweşiya xwe nekin, ger hûn wê nexwazin, ew jî we naxwaze.

*Bulwer-Lytton*

*

Welatê hunermendên mezin tune ye.

*Alfred de Musset*

*

Ger hunera kirina gotineke xweş hebe, hunera xweştêgihîştin û xweşguhdarîkirinê jî heye.

*Epiktetos*

*

Huner, xwezayeke, ku ji aliyê mirovan ve hatiye holê.

*Owen Merith*

*

Hunera herî baş hunera jiyanê ye.

*John Macy*

*

Huner çiqas dirêj e Xwedêyo, jiyan çiqasî kin e.

*Goethe*

*

Tu hunermendên mezin, tu tiştên der û dora xwe mîna ku heye nabînin, ger wan wilo bidîtana, ew nedibûn hunermend.

*O. Wilde*

*

Huner ne nanê jiyanê, şeraba wê ye.

*Jean Paul Richter*

*

Ger dinya vekirî û rohnî bûya, huner çênedibû.

*Albert Camus*

*

Ew nemir, veqetiya; hunermend namirin ku.

*Longfellow*

*

Huner hêz e.

*Longfellow*

*

Pere di pêş de dimeşe û ji mirovan re hemû riyan vedike.

*Shakespeare*

*

Qîmeta peran xuya ye, lê carinan ew qîmet qet namîne, dadikeve binê sifrê.

*Carlyle*

*

Pere pir kesan hînî riyên xerab dike.

*Choderlos de Laclos*

*

Pere mirovan bextiyar nake, lê ji bo bextiyariya mirov dibe alîkar.

*Choderlos de Laclos*

*

Yê ku ji welatê xwe re bibe, ji partiya xwe re jî dibe.

*R. B. Hayes*

*

Resim helbesteke bê kelîme ye.

*Horatius*

*

Di dinyayê de tiştê herî bi qîmet, ruhekî bi hereket e.

*Emerson*

*

Sebir, navekî hêzê yê din e.

*E.B.Browning*

*

Sebir, hunera hêvîkirinê ye.

*Vauvenargues*

*

Mûyekî porê jinekê, ji sed cot ga baştir dikişîne.

*James Howell*

Mirovên qenc tu carî namirin.

*Callimachus*

Ya ku ez kirime nemir, ramûsanên te ne.

*Margaret Fuller*

*

Dengê herî xweş pesin e.

*Ksenophon*

*

Ger te ez hindik bipesinandima, min ê tu pir bipesinanda.

*Luis XIV*

*

Yê ku peyayekî bipesinîne, mîna ku wî bifetisîne.

*Hz. Emer*

*

Peyayekî biaqil hewcedarî lêborînê nabe.

*Emerson*

*

Li cihekî ku her tişt bi peran tê pîvan, edaleta civakî û rehetî nayê lidarxistin.

*Sir Thomas More*

*

Pere, xulamekî baş, efendiyekî xerab e.

*Bacon*

*

Pere an bela serê me ye, an jî xizmetkarê me ye.

*Horatius*

*

Cihê ku pere lê dipeyive, rastî bêdeng dimîne.

*Gotineke Rusî*

*

Ger hûn bixwazin hînî qîmeta peran bibin, wê çaxê deyn bikin.

*Franklin*

*

Hezkirina peran, destpêka hemû xerabiyan e.

*Incîl*

*

Gêjik jî carinan şîretên baş dikin.

*Boileau*

*

Ji şîretên ku têne kirin tenê biaqil jê destkewtî dibin.

*Syrus*

*

Carinan ez şîretên pir baş li xwe dikim, lê ez qet li wan guhdarî nakim.

*Lady Montagu*

*

Şîreta herî baş tenê tu dikarî li xwe bikî.

*Cicero*

*

Ev mirin e, ne hukumdaran nas dike, ne jî soyteriyan, hemûyan bi eynî îştahê dadiqurtîne.

*Victor Hugo*

*

Tirsa mirinê ji mirinê bitirstir e.

*Schiller*

*

Mirinek bişeref, ji jiyaneke bêşeref çêtir e.

*Tacitus*

*

Mirin tiştekî kevin e, lê bi herkesî nû dixuye.

*Turgenyev*

*

Tirsa mirinê ji mirinê bêtir mirov ditirsîne.

*Seneca*

*

Berî ku em bi rastî bimirin, em hezar carî dimirin.

*W.E.Henley*

*

Mirin carinan cezayek, carinan diyariyek, carinan jî qenciyek e.

*Seneca*

*

Ne bi qehrê, bi ken mirovan bikuje.

*Nietzsche*

*

Hemû jin bi hunera veşartina qehra xwe dizanin, hela ku baş qeherî bin.

*Rousseau*

*

Ger tu biqeherî heta bi çaran bihejmêre, ku tu pir biqeherî jî çêran bike.

*Mark Twain*

*

Mirovekî tengizî çavên xwe digire û devê xwe vedike.

*Cato*

*

Ji tengezariya mirovê bi sebir bitirse.

*Dryden*

*

Bi qehrê re aqil jî difire û diçe.

*Lessing*

*

Mirov nikane lîstikên nû hînî segên pîr bike.

*Anonim*

*

Hemû kesên ku nizanin hîn bibin, dibin mamosta.

*Oscar Wilde*

*

Yê bi tiştekî nizanibe, tiştekî jî ji bîr nake.

*Chevalier de Panat*

*

Mirov her ku pîr dibe, bi nexweşiya şîretkirinê dikeve.

*E.Renan*

*

Di karên xwe yê şexsî de, ji kesî şîretan nexwaze.

*Thornton Wilder*

*

Mirovên herî xerab, carinan şîretên herî baş dikin.

*P. J. Bailey*

*

Tu çi şîretê dikî bike, tenê bila kurt be.

*Horatius*

*

Kesên bi namûs ne ji ronahiyê, ne jî ji tarîtiyê ditirsin.

*Thomas Fuller*

*

Nefret jî mîna evîna rastîn roj bi roj gurr dibe.

*Balzac*

*

Mirov ji deyndarên xwe nefret dike.

*Arthur Miller*

*

Ger çavên evînê kor be, çavên nefretê kortir e.

*La Rochefoucauld*

*

Yek tişt heye ku mirovan biaqil dike, ew jî nefret e.

*Albert Camus*

*

Nefreta ku vekirî tête nîşandan, firsenda tolhilanînê nahêle.

*Seneca*

*

Evîndarî û nefret ne di destên mirov de ye.

*Anton Çexov*

*

Ji ber dilxerabiyê, mirovê dilxerab dikare hezkiriya xwe bikuje, lê jê nefretkirin ne mumkun e.

*Henry Fielding*

*

Ez hewesa xwe ya xwendinê bi hemû xizneyên Hindîstanê nadim.

*Gibbon*

*

Pêşî pirtûkên baş bixwînin, an na ji bo xwendina pirtûkan tu hewesa we namîne.

*Thoreau*

*

Piraniya lîstikvanan di bingeh de temaşevan in.

*Ben Jonson*

*

Lîstikvanekî ku perên wî hebe ne name, ew ê telegrafan bişîne.

*A. Çexov*

*

Li bextiyariyê bigere, qet jê megere.

*George Sand*

*

Min bextiyariya xwe ji xwe re kiriye derd.

*F. G. Lorca*

*

Bextiyariya ne qenc, mîna lehiyê diherike, dawî tê.

*Racine*

*

Kî bêhnpak û rast be, ew bextiyar e.

*Eflatun*

*

Bextiyariya yekî hertim di destên yekî din de ye.

*Jane Austen*

*

Bextiyarî ji ewçend pir perçeyan pêk tê, ku hertim çend perçe jê kêm in.

*Bossnek*

*

Bextiyarî zexmiyê diafirîne.

*C. W. Curtis*

*

Herkes hesinkerê bextiyariya xwe ye.

*Gotineke Almanan*

*

Muzîk zimanê mirov yê gerdûnî ye.

*Langfellow*

*

Muzîk buhuşta di bin me de ye.

*Addison*

*

Yê ku ji çaran sisiyê temenê xwe dabe xwendinê, wê helbet bi namûs be.

*Diderot*

*

Em çiqasî hindikî bizanibin, em ewçend bi şik in.

*H.W.Shaw*

*

Tiştê ku em hindikî pê dizanin, em qet jê ne bi şik in.

*Goethe*

*

Baweriya xwe bi tiştekî neyne, li hemberî her tiştî bi tevdîr be.

*Gotineke Latînî*

*

Şik, ji bêhêvîtiyê jî xerabtir e.

*Sir John Denham*

*

Ji bo em baweriya xwe bi tiştekî bînin, divê em bi şikî dest pê bikin.

*Stanislaus*

*

Makîne namirin, lê peyayên serî-makîne dimirin.

*Gerald Stanley Lee*

*

Min ev name ji ya hertim dirêjtir nivîsand, ji ber ku wextê min û nivîsandina kurtenameyan tune ye.

*Pascal*

*

Bi tenê tiştek ne di destên mirov de ye, ew jî îdarekirina demsalan e.

*Lowel*

*

Bihar keçek ciwan, havîn dayikek, payiz jinebiyek, zivistan jî dêmariyek e.

*Gotineke Poloniyan*

*

Di bin sazûmaneke stemkar de, mîzah dibe zanist.

*O. Beer*

*

Ji bo kesan şik çi be, ji bo parlemento jî muxalefet ew e.

*Anonim*

*

Mirov tenê gava ku hez dike, xerabiyê nake.

*Anatole France*

*

Ger mirovan xerabî nas nekiribûna, wê çaqasî bextiyar bûna.

*Andre Gide*

*

Xerabiya ku ez bi hinin din nekim, hinin din dikarin bi min bikin.

*Alfred de Musset*

*

Mirov xerabiyan bi xwe diafirîne.

*Rousseau*

*

Bûyerên xerab ji sedemên xerab dertên.

*Aristophanes*

*

Zora xerabiyê bi xerabiyê nebe, bi qenciyê bibe.

*Încîl*

*

Mirov bi hêsanî dikeve nava xerabiyan, lê bi zehmetî jê derdikeve.

*Mme de Maintenon*

*

Tirsa ku ji xerabiyê dertê, mirov hê bêtir dajo ser xerabiyê.

*

Xerabiya ku mirov bi hinin din kiribe û ya ku hinin din bi mirov kiribe, di eynî mêzînê de nayê kişandin.

*Assopos*

*

Jiyaneke xerab, celebekî mirinê ye.

*Ovidius*

*

Qumar; zaroka hêrs û timayê, hevalê xerabiyê û bavê zerar û ziyanê ye.

*Geora Washington*

*

Hêz û azadiya milet rewşenbîrên milet e; rewşenbîrên bi namûs, bîrewer, bihîstyar û xebatkar.

*Çexov*

*

Ger tirsonekî ji bo min baş be jî, ez dîsan nêzîk nabim.

*Napoleon*

*

Yê ku ji kesî natirse, mîna yê ku her kesî ditirsîne, bi hêz e.

*Schiller*

*

Tirs, koletî ye.

*Eflatun*

*

Hevaltiya evînê, her tim tirs dike.

*Racine*

*

Tirs, piraniya caran mirov hînî derewan dike.

*Alferd de Vigny*

*

Mirina kûçikan jî bi kûçikanî dibe.

*Anton Çexov*

*

Kûçik bê sedem nareyin.

*Kalevala*

*

Li welatê koran, yê bi çavekî dibe qiral.

*Erasmus*

*

Em hemû bi xerabiyên ji bo xwe dizanin.

*Tolstoy*

*

Bi mirovan xerabîkirin, ji kirina qenciyê hêsantir e.

*Eflatun*

*

Peyivîn, hunera mêjîbikaranîna mirovan e.

*Eflatun*

*

Tiştê ku tu dibêjî ez qebûl nakin, lê ez heta mirinê mafê te û gotinê diparêzim.

*Voltaire*

*

Pir guhdarî bike, hindikî bipeyive.

*Blas*

*

Kurtetêgihîştina van gotinên dirêj çi ne?

*Schiller*

*

Carinan tiştê ku mirov ji hev du re bibêje tune ye, lê dîsan jî mirov dipeyive.

*Senancour*

*

Derew ji tirsê dizê.

*Dostoyevskî*

*

Tirs, li bendîmayina xerabiya pêşerojê ye.

*Eflatun*

*

Peyayên tirsonek, bi namûs nabin.

*D. Szabo*

*

Mirovên ku di nava tirsê de bijîn, qet ne azad in.

*Horatius*

*

Tirs, ji nezaniyê dertê.

*Emerson*

*

Gava tirsonek ne di talûkê de bin, kulma xwe li ba dikin.

*Goethe*

*

Kes ji mêrê tirsonek hez nake.

*Aristoteles*

*

Pirtûk bîrdariya serên windakirî ne.

*Sir Wiliam Davenant*

*

Ji bilî welatên kovî, hemû welat ji aliyê pirtûkan ve têne îdarekirin.

*Voltaire*

*

Pirtûka ku bi hêvî vebe û bi qezenc bête girtin ew pirtûkeke baş e.

*Alcott*

*

Mêrekî baş divê êvaran berî her kesî ranezê û sibehan piştî her kesî ranebe.

*Balzac*

*

Di çavên jinê de mêr împerator e.

*Byron*

*

Ji peyayê baş mêrê xerab dernayê.

*Shakespeare*

*

Bêhevaltî dibe, lê bêcîrantî qet nabe.

*Thonas Fuller*

*

Ji cîranê xwe hez bike, lê dîwarê navê raneke.

*George Herbert*

*

Dîwarên zexim, cîranên zexim diafirînin.

*Robert Frost*

*

Tu mêvan ji sê rojan zêdetir nayên kişandin.

*Plautus*

*

Masî û mêvan di sê rojan de kevin dibin.

*John Lyly*

*

Bêdengî jî celebekî hunera peyvê ye.

*Hazzlitt*

*

Ji berdêla tu ê bipeyivî û gêjiktiya xwe nîşan bidî, nepeyive, da şika herkesî li ser te bimîne.

*Lincoln*

*

Yên ku dostên wan tunebin, dijminên wan jî çênabin.

*Tennyson*

*

Gava mirov behsa şexsiyeta hinin din dike, mirov şexsiyeta xwe qenc davêje ortê.

*Jean Paul Ricchter*

*

Pirtûkek baş, hevalekî baş e.

*Saint-Pierre*

*

Pirtûk sar in, lê dostên bi bawerî ne.

*Victor Hugo*

*

Unîversîteya îro ya rastîn, koleksiyona pirtûkan e.

*Thomas Caryle*

*

Hevalên herî baş, pirtûkên herî baş in.

*Lord Chesterfield*

*

Pirtûk, gorra fikrê ye.

*Langfellow*

*

Maleke bê pirtûk mîna gewdeyekî bê ruh e.

*Cicero*

*

Pirtûk zarokên mêjî ne.

*Swift*

*

Pirtûkek, carinan dikare mîna şerekî mezin bibe.

*Benjamin Disraeli*

*

Ji berdêla kuştina pirtûkeke baş, mirov peyayekî bikuje çêtir e.

*Milton*

*

Min pirtûkên xwe neafirandine, wan ez afirandime.

*Montaigne*

*

Qîmeta mirovekî bi pirtûkên wî ve tête pîvan.

*H. Spencer*

*

Gava mirov jinê dineqîne û şûr dikire, divê mirov baweriya xwe bi kesî neyne.

*George Herbert*

*

Ger yek hînî hêza gotinan nebe, hêza mirovan jî nas nake.

*Konfuçyus*

*

Bi gotinekê, guhertina jiyana mirovan pir hatiye dîtin.

*Balzac*

*

Yên ku bi serketina xwe bawer in, bi ser dikevin.

*Vergilius*

*

Yên ku baweriya xwe bi xwe tînin, dikarin dinyayê jî îdare bikin.

*Voltaire*

*

Xwedê ji kesên ku pesnê xwe didin, nefret dike.

*St. Clement*

*

Sedema jihevheznekirina jinan, mêr in.

*La Bruyere*

*

Çawan ku kûçikên biçûk li hemberî biyaniyan direyin, peyayên mezin jî di civatan de wilo direyin.

*Seneca*

*

Dilxerabî hîseke ku mirovî biçûk û nizim dike.

*Tolstoy*

*

Dilxerabî wek mar e, bi xwediyê xwe vedide.

*Sophokles*

*

Ne bi tenê li ruyê mirovan, li hundirê wan jî binihêrin.

*Chesterfield*

*

Mêr ji jinên zane nefret dikin.

*Tennyson*

*

Jinek an hez dike, an jî nefret dike, nîvê wê tune ye.

*Syrus*

*

Gelek ji jinan mîna resimên xwe ne ciwan in.

*Sir Max Beerbohm*

*

Yê pisîkan neh ruhê wan, yê jinan jî bi qasî neh pisîkan ruhê wan heye.

*Fuller*

*

Di dinyayê de tiştê ku pir tê guhertin awayê porşehkirina jinan e.

*J. Addison*

*

Ji keçek xerab jina baş dernakeve.

*Benjamin Franklin*

*

Liberketinên jinan wek bahozên havînan e; xurt e, lê kurt e.

*Joanna Baillie*

*

Jin çavên ku her tiştî dibîne jî, dixapîne.

*Dostoyevskî*

*

Jina herî baş ew e ku hê ji dayika xwe nebûye.

*Fîrdewsî*

*

Pênûs, di destê nêçîrvanê xam de, dikare bibe tîreke ku hedefa xwe şaş dike.

*Baraccio*

*

Xwîna xwînrêjan ne pak e

*Baraccio*

*

Gul ji bo bêhndayinê, agir ji bo tînê, jin jî ji bo bextiyarkirinê hatine afirandin.

G. *Gardony*

*

Tiştê ecêb li ba jinan, ne bêî wan, ne jî bi wan re mirov dikare bijî.

*Byron*

*

Jina ku mirov dikeve dû, li ber çavên mirov wek melekekê ye, gava mirov bi dest dixe, dawiya her tiştî tê.

*Shakespeare*

*

Jina ku jê tête hezkirin, hertim bi heq derdikeve.

*Alfred de Musset*

*

Jin bi tenê bi çavan nayêne neqandin, tu wê, ji çavan bêtir bi guh bineqîne.

*Thomas Fuller*

*

Kabîliyet ew e ku mirov pê bilind bibe, ne ku pê nizim bibe.

*Rousseau*

*

Ez her tiştî diceribînim, lê tiştê ku ez dikarim bikim, ez dikim.

*Herman Melville*

*

Qeder dijmineke ecêb e.

*Euripides*

*

Qederê tu caran zora îrada min nebiriye.

*Napoleon*

*

Her dil qedera xwe ye.

*Bailey*

*

Lêdana dil dengê qederê ye.

*Sciller*

*

Hatina xwe em bi xwe hazir dikin, paşê jî em dibêjin, qeder e.

*Disraeli*

*

Tolhilanîn şêrîn e.

*William Paintier*

*

Tolhilanîn, gotineke ku bi mirovatiyê re têkiliya wê tune ye.

*Seneca*

*

Ger tu nikanibî tiştê tu dixwazî bikî, tiştê tu dikanî bikî bixwaze.

*Terenece*

*

Serîhildanên ku carinan çêdibin, ji xweşiya hukûmetê re dibin dermanên parastinê.

*Jefferson*

*

Yê ku qencî jê were û neke, ew sûcdarek e.

*Pestalozzi*

*

Ger tu dixwazî qenc bibî, bi neqenciya xwe bawer be.

*Epiktetos*

*

Tu pirtûkên baş bi carekê ve rûyê xwe yê rast nîşan nadin.

*Carlyle*

*

Kî çi dibêje bila bibêje, kî çidike bila bike, ez ê qenc bim.

*Aurelius Antoninus*

*

Ev dinya ji bo xwedîkabîliyetan ne lal e.

*Goethe*

*

Mirov jî mîna heywanan kovî ne, tenê ferqek wan heye, ew li ser xwe rûdinîn.

*Philemon*

*

Ger mirov nebûna, gerdûn jî nedibû.

*N. Longfellow*

*

Mirov carinan dixwaze ku hemû mirovan bi dar ve bike û dawiya vê komediyê bîne.

*Mark Twain*

*

Ger bawerî winda bibe û şeref bimire, mirov jî diçe.

*Whittier*

*

Mirov gurê hev in.

*T. Hobbes*

*

Nasîna hemû mirovan bi carekê, ji nasîna mirovan ya yek bi yek hêsantir e.

*La Rochefoucauld*

*

Mirov, pîvana her tiştî ye.

*Protagoras*

*

Ger tu zanibe bixwînî, tu dê bibînî ku her mirovek pirtûkek e.

*W. E. Channing*

*

Mirov tiştê ku herî hindik pê dizane, herî pir baweriya xwe pê tîne.

*Montaigne*

*

Mirov her bi tenê ye, dinya jî vikî vala ye.

*Jean Anouilh*

*

Mirovatî lawê Xwedê ye.

*T. Parker*

*

Xwekuştin, tirsonekî ye.

*Napoleon*

*

Herkes durû ye.

*Fredrick IV*

*

Ger mirov ji xwe pêve hinin din mînak negire, mirov bi pêş nakeve.

*Goldsmith*

*

Di konên ku bavên me çêkirine de nenivin, bi dinya ku bipêş dikeve re gavan biavêjin.

*Mazzini*

*

Mirov ne ji guhên xwe, divê ji çavên xwe bawer bike.

*Montaigne*

*

Bêîmkanî gotineke ku tenê di ferhenga bêhişan de tête dîtin.

*Napoleon*

*

Bawerî dewama êqil e.

*William Adams*

*

Tu qîmeta baweriya bêhezkirin tune ye.

*Martin Cuther*

*

Bi nîvê tiştê tu dibînî bawer bike, bi tiştê tu dibihîzî qet bawer meke.

*Dinah Mulock Craik*

*

Bawerî hêza jiyanê ye.

*Tolstoy*

*

Mirov bi kêmasiyan ve tijî ye.

*Balzac*

*

Mirov bi serê xwe difikire, bi dilê xwe dibihîze û bi meda xwe dixwaze.

*Unamuno*

*

Ger azadiya fikrê tunebe, azadiya mirovan jî tune ye.

*Voltaire*

*

Yên ku ne azad bin û mîna ku azad in xwe nîşan bidin, ew koleyên herî mezin in.

*Goethe*

*

Azadiya mirov, bi destpêkirina azadiya cîranên mirov ve dawî tê.

*F. W. Karrar*

*

Di dinyayê de du tişt hene ku ez dixwazim û jiyanê bi min dide hezkirin; evîn û azadî. Di ber evînê de pêwîst be ez ê jiyana xwe bidim, lê ji bo azadiyê ez evîna xwe jî feda dikim.

*Victor Hugo*

*

Gava mirov jiyanê û nejiyanê weke hev bibîne, hingî mirov digihîje azadiya xwe.

*Dostoyevskî*

*

Azadî bi tenê li cihên ku gel hukûmetê kontrol dikin, heye.

*Woodrow Wilson*

*

Gava dara azadiyê bi xwîna zaliman tête avdan, geş dibe.

*Barere*

*

Ax, azadî! Li ser navê te çi mirov têne kuştin!

*Mme Jeanne Roland*

*

Hin kes tesîrê li vexwarinê nakin, lê vexwarin zû tesîrê li wan dike.

*T. Williams*

*

Serxweşî, xwekuştineke derbasî ye.

*Bertrand Russell*

*

Vexwarina peyayên biaqil tenê av e.

*Thoreau*

*

Ez bextiyariyê naxwazim êdî, jiyan ji bextiyariyê jî bi rûmettir e.

*Bernard Shaw*

*

Jiyana bê fêde, mirineke zû ye.

*Goethe*

*

Di rojên xweş de, li rojên nexweş jî bifikirin.

*Thomas Fullers*

*

Tiştê ku em ê di şer de bi kar bînin, divê em di aştiyê de amade bikin.

*Syrus*

*

Tu ba alîkariya keştiya bêarmanc nake.

*Montaigne*

*

Bi mêrxasî bipeyive, rastiyê bibêje da ku şeytan fedîkar derkeve.

*Eaumont û Fletcher*

*

Her kes bi riya xwe diçine buhuştê.

*Fredrikê Mezin*

*

Xweşdîtin dînê herî baş e.

*Victor Hugo*

*

Hukûmeta herî baş ya ku mirovên wê yên bêkêr herî hindik in.

*Voltaire*

*

Qedera hukûmetê hertim di destên çekhilgirên wê de ye.

*Aristoteles*

*

Hukûmeta herî baş ew e, ku bikaribe bextiyariyê bide gelê xwe.

*Macaulay*

*

Tu tişt weke xeyalên mirovan azad tune ye.

*David Hume*

*

Jiyan bi hinan şêrîn, bi hinan jî tehl e.

*Turgenyev*

*

Mêr jiyanê pir zû, jin jî pir dereng nas dikin.

*Oscar Wilde*

*

Tu tişt mîna jiyanê ne bi qîmet e.

*Euripides*

*

Ji jiyanê metirsin zarokno! Gava hûn tiştekî baş û rast dikin, jiyan çiqas xweş e!

*Dostoyevskî*

*

Di jiyanê de hertim xweşî û nexweşî têkel e.

*Ludwig Tieck*

*

Jiyan hunereke zehmet e.

*Brachvogel*

*

Qîmeta jiyanê ne pir jiyîn e, baş jiyîn e.

*Montaigne*

*

Tiştê ku wê di pêş de zehmetiyê bide te tevlî jiyana xwe meke.

*Emile Zola*

*

Jiyan xewneke mirinê ya bêdawî ye.

*James Thomson*

*

Jiyan ji bo bextiyaran kurt, ji bo bedbextan jî dirêj e.

*Apollonius*

*

Jiyan derseke dirêj ya mirovatiyê ye.

*Barrie*

*

Tiştekî spehî her tim ne baş e, lê tiştekî baş her tim spehî ye.

*Ninon de L'Enclos*

*

Spehîtî hêz e, devkenî jî şûrê wê ye.

*Charles Reade*

*

Gava ronahî vedimire, hemû jin xweşik in.

*Plutarkhos*

*

Dengê gel dengê Xwedê ye.

*Alculn*

*

Ji bo gihîştina gelekî sê tişt pêwîst in; dibistan, dibistan, dîsan dibistan.

*Tolstoy*

*

Gel ji tiştên baş bêtir, baweriya xwe bi tiştên nebaş tînin.

*Boccaccio*

*

Nexweşî tê hîskirin, lê xweşî nayê hîskirin.

*Thomas Fuller*

*

Nexweş ji xweşan bêtir dijîn.

*Theodor Fontana*

*

Pirxwarin havêna nexweşiyê ye.

*F. Attar*

*

Nexweşî xizmetkara mirinê ye.

*Francis Rous*

*

Mirov ancax dikare bi xeyalên vala bextiyar bibe.

*Stefan Zwing*

*

Xeyal çavên ruh e.

*Joubert*

*

Divê rojên jiyanê yên nebaş hebin, da mirov bikaribe zexmî û mêrxasiya xwe nîşan bide.

*Senancour*

*

Ro, rojê du caran hilnayê.

*Victor von Scheffel*

*

Roya bê sî tuneye.

*Albert Camus*

*

Roya ku diçe ava, her sibeh ji nû ve hiltê.

*Catallus*

*

Roya min ji bo ku carek din hilê diçe ava.

*Robert Browning*

*

Ro li her welatî sibehan hiltê.

*George Herbert*

*

Bi her kesî re bide û bistîne, bi hindik kesan re têkiliyan deyne, yê ku tu bixwazî baweriya xwe pê bîne jî baş biceribîne.

*Washington*

*

Gelo li vê dinyayê kî heye ku bawerî anîbe û nehatibe xapandin?

*Eliza Cook*

*

Di dinyayê de hêza herî mezin spehîtî e.

*Anatole France*

*

Spehîtiya ruh, wek spehîtiya gewde baş naxuye.

*Aristoteles*

*

Spehîtî bi bask e, zû difire.

*Edward Moore*

*

Spehîtî û aqil kêmcaran li nik hev tên dîtin.

*Petronius*

*

Spehîtî û kêmaqilî du kevneheval in.

*Benjamin Franklin*

*

Tu rû wek rûyên ku bi hêsirên çavan têne şuştin pakij tune ne.

*Shakespeare*

*

Yê ku bixwaze hêsirên çavan biçine, divê hezkirinê biçîne.

*Sciller*

*

Tu tişt weke hêsirên jinan zû ziwa nabe.

*Thomas Fuller*

*

Hêsirên çavan gotinên xemê yên bêdeng in.

*Voltaire*

*

Min li ku benderuhek dîtibe, ew dixwaze li wir bi hêz bibe.

*Nietzsche*

*

Carinan yek tênagihêje bê mirov ji bo çi dikenin.

*Dostoyevskî*

*

Ji bo ku ez negirîm ez bi her tiştî dikenim.

*Beaumarchals*

*

Mirovan evqasî zehmetî kişandine ku mecbûr mane ken afirandine.

*Nietzscehe*

*

Mirovê ku nizane bikene, ne ku tenê xayintiyê dike, herweha jiyana wî bi xwe xayintî ye.

*Carlyle*

*

Mirovê bêhêvî nikane derkeve serê çiyayên rastiyê.

*Nietzsche*

*

Her tiştê ku dibiriqe ne zêr e.

*Cervantes*

*

Kirinên xweşikan xweşik in.

*Fielding*

*

Laşekî xweş ji bo ruhê mirovan wek odeya mêvanan, laşekî nexweş jî weke girtîgehekê ye.

*Bacon*

*

Çavên herî xweşik, carinan çavên herî derewîn in.

*Victor Hugo*

*

Yên ku ji bo hinin din bigirîn ji çavan dibin.

*Tolstoy*

*

Çav, ji bilî xwe her tiştî dibîne.

*Thomas Fuller*

*

Zimanê evînê di çavan de ye.

*Phineas Fletcher*

*

Çav, pencereya ruhê mirovan e.

*Du Bartas*

*

Çav ji xwe, guh jî ji yên din bawer dike.

*Gotinek Almanan*

*

Mirov dikane bi çavên girtî jî bibîne.

*Coleridge*

*

Hêsirên çavan ziwa dibin.

*Dostoyevskî*

*

Ez li paşeroja xwe dinihêrim û hatina xwe dibînim.

*Patrice Henry*

*

Dîtina îro ji dîtina pêşerojê hêsantir e.

*Franklin*

*

Piştî ku xortaniya me diçe, em paşê jê hez dikin.

*Holderlin*

*

Piraniya mirovan ku pîr dibin xortaniya xwe ji bîr dikin.

*Boccaccio*

*

Yên ku şeraba xortaniyê tehmandibin, di dinyayê de ji xwe pê ve kesî nabînin.

*Fîrdewsî*

*

Ji xewnên xortaniya xwe bi dûr nekevin.

*Sciller*

*

Li ser gihandina xortan raweste, ji ber ku di vê riyê de xemsariyek dikare hebûna welêt mehû bike.

*Arîstoteles*

*

Jiyana rastiyê bêdawî ye.

*F. Herczeg*

*

Nîvrastî pirraniya caran dereweke muezem e.

*Franklin*

*

Rastî ji derengmayinê hez nake.

*Seneca*

*

Tiştê ku mirovan birîndar dike, rastî ye.

*Napoleon*

*

Mirovatî hewcedarî rastiyê ye.

*Bacon*

*

Filozof pîlotê xwezayê ye, gava ku dixwaze bibe buhuştê ber bi dojehê ve tête kişandin.

*Bernard Shaw*

*

Felsefe mîkroskopa ramanê ye.

*Victor Hugo*

*

Felsefe, şik e.

*Montaigne*

*

Firsend mîna jineke delal bi naz e, ger carekê derî girtî bibîne, careke din nayê.

*Grillparzer*

*

Firsend du caran li deriyê mirov naxe.

*Chamfort*

*

Firsenda ku mirov bi carekê ve winda bike, tu caran bi paş de nayê.

*Schiller*

*

Firsend wek ewrên havînê ye.

*Harîrî*

*

Firsend revok e.

*Geothe*

*

Ger deriyek were girtin, deriyekî din vedibe.

*Cervantes*

*

Yê ku zîpik li ser bibare,wilo bawer e, ku li hemû aliyê dinê bahoz e.

*Montaigne*

*

Paşeroj ji satilek xwelî pê ve ne tiştek e.

*Carl Sandburg*

*

Pêxemberê pêşerojê yê herî baş, paşeroj e.

*John Sherman*

*

Zewac û hevduberdan bi tenê di destên jinan de bûya tu mehr saxlem nedima.

*Dostoyevskî*

*

Zewac gora evînê ye.

*Stendahl*

*

Ya ku pîroziyê dide zewacê evîn e.

*Tolstoy*

*

Xort ji bo ku diwestin dizewicin, keç jî ji bo ku meraq dikin dizewicin, dawiyê hemû jî poşman dibin.

*Oscar Wilde*

*

Mêrekî kerr û jineke kor, jinûmêrekî dilşa ne.

*Gotineke Danmarkî*

*

Jin berî ku bizewicin, mêr jî piştî ku dizewicin digirîn.

*Gotineke Polonî*

*

Evîn berbanga zewacê, zewac jî êvara evînê ye.

*De Finod*

*

Zewaca bêî hezkirin, mîna îbadetkirina bêî bawerî kirêt e.

*Çexov*

*

Felsefe di ser hemû huneran re ye.

*Eflatun*

*

Ji ku? Bi ku de? Ji bo çi? Çawa? Ev pirs hemû ji felsefê pêk tên.

*Joubert*

*

Di felsefê de ne gihîştina armancê, lê riya wê girîng e.

*Havelock Ellis*

*

Rexnegir her dibêjin, em ji nivîskaran tênagihîjin. Gelo ev sûcê nivîskaran e?

*A. W. Hare*

*

Destek destê din, herdu dest jî rûyekî dişon.

*John Florio*

*

Xwedê ne li destên tijî, lê li destên paqij dinêre.

*Syrus*

*

Ger destên te li hemberî herkesî bin, wê destên herkesî jî li hemberî te bin.

*Încîl*

*

Ger pozê Kleopetrayê hebekî din jî kin bûya, wê hemû rûyê dinyayê bihata guhertin.

*Pascal*

*

Birûmetî diyariya bext e.

*Cicero*

*

Xewa bêhnfirehan xweş e.

*Addison*

*

Her dîk li ser sergoyê xwe bang dide.

*Seneca*

*

Zewaca bêî evîn, evîn bêî zewaca tîne meydanê.

*Benjamin Franklin*

*

Gava mirov cara pêşî pirtûkekê dixwîne, mîna ku mirov ji xwe re dostekî nû peyda bike; gava mirov cara dudan bixwîne mîna mirov dostekî xwe yê kevin bibîne.

*Anonîm*

*

Egoist hertim zerarê dide yê ku ew herî pirr jê hez dike, yanî zerarê dide xwe.

*B. Peers*

*

Kêf çavên êqil kor dike.

*Cicero*

*

Ji berdêla ku tu ê li neynikê binihêrî, li kincên li xwe binihêre.

*Baraccio*

*

Ger mirov şerabê bide yekî birçî, weke mirov bişkokek milê gomleg bide yekî bê gomlek.

*Tom Brown*

*

Kinc di derheqa mirovekî de tu zanebûnê nade.

*Yriarte*

*

Li yên ku xwe pir dixemilînin binihêrin, hemû jî dixwazin xwe veşêrin.

*Aristo*

*

Dibe ku rexne ne tiştekî spehî be, lê pêwîst e. Ew jî mîna êşê ye, nexweşiya giyanê mirov bi mirov dide zanîn.

*Churchill*

*

Ji berdêla ku wê ji helbesteke min ya nebaş re çepik lêbikevin, bila ji helbesta min ya baş re fîtik lê bikevin çêtir e.

*Victor Hugo*

*

Rexnegir ew kes in ku di hunermendî û edebiyatê de bi ser neketine.

*Disraeli*

*

Hînbûyina bêî fikir, windakirina demê ye.

*Confucius*

*

Bi tenê yên mirî û yên kêmaqil fikrên xwe naguherin.

*Lowell*

*

Fikrên ku di dilê nefsbiçûkan de dijîn, fikrên bilind in.

*Montaigne*

*

Tiştek heye ku ez dizanim namire, ew jî raman e.

*Meredoth*

*

Mirov nikane fikrên xwe yên ku tênakoşe biguhere.

*Thomas Mann*

*

Herkes di fikrên xwe de dikanin şaşiyan bikin, lê

kêmaqil ji fikrên xwe nagerin.

*Cicero*

*

Ramana ku şiyar bibe, careke din ranazê.

*Carlyle*

*

Tiştê ku mirov mezin dike raman e.

*Pascal*

*

Edebiyat cumhûriyeteke ku ji nivîsan pêkhatiye.

*Moliere*

*

Mirovê ku li ser xwe û li ser dema xwe binivîsîne, mîna ku ew li ser her kesî û her demê dinivîsîne.

*Bernard Shaw*

*

Ji bo ku mirov bikanibe romaneke mezin binivîsîne, divê mirov hebekî dînik be.

*John Gardner*

*

Maleke bêî pirtûk, mîna xaniyekî bêî pencere ye.

*Moa Martinsson*

*

Tirsa mirinê her kesî dajo ser duakirinê.

*Senece*

*

Dua dengê baweriyê ye.

*Honre*

*

Ma hûn dizanin ji bo çi li hemberî du guhên me zimanekî me heye? Ji bo ku em pirr guhdarî bikin û hindikî bipeyivin.

*Diyojen*

*

Dinya dikek e, piştî ku herkes rola xwe li ser bileyize, ew ê jî here.

*Winschooten*

*

Dinya saloneke tiyatroyê ye, yên ku perên wan hebe, ew ê li cihên baş rûnên.

*S. Maugham*

*

Yê ku bi tenê dijminekî wî hebe, li her derê li wî rast tê.

*Emerson*

*

Ji berdêla ku wê dijminê min bibe dost, dostê min bibe dijmin çêtir e.

*Bias*

*

Dijminê dijminê min, dostê min e.

*Anonim*

*

Mirov dijminê xwe yê herî mezin e.

*Cicero*

*

Dijminê we yê herî mezin di nava we de ye.

*Hz. Mehemmed*

*

Mirovên baş qet bêî dijmin nabin.

*Alessandro Manzoni*

*

Parsek şerma xwe di kîsikê xwe de digerînin.

*Baraccio*

*

Mirov ji bo dîn dinivîsîne, şer dike, dimire; lê mirov nizane ji bo dîn bijî.

*Colton*

*

Li min xe, lê li min guhdarî bike!

*Themistokles*

*

Ger dîplomatek bibêje,"erê" hûn mana "belkî" jê derxin; ger bibêje,"belkî" hûn mana"na" jê derxin... Lê ku bibêje,"na" wê çaxê ew ne tu dîplomat e.

*Anonim*

*

Xweza di çêbûneke matematîkî de ye.

*Galilei*

*

Xweza, pirtûkeke ku ji aliyê Xwedê ve hatiye nivîsandin.

*Marvey*

*

Xweza bêî mirov jî dikane bijî, lê mirov nikane bêî xwezayê bijî

*P. Rehruch*

*

Wext bi qîmet e, lê rastî bi qîmettir e.

*Disraeli*

*

Rastî roja ebedî ye, çawan be wê hilê.

*Wandell Phillips*

*

Derew dimire, rastî namir e.

*Mary Baker Eddy*

*

Mîna hûn ji xwe re hevalekî dineqînin, nivîskarê xwe jî wilo bineqînin.

*Roscommon*

*

Gelî dostan, li dinyayê dost tune ne.

*Aristoteles*

*

Heta ku lingên min li reşayê bin, ez ji deryayê hez dikim.

*Douglas Jerrold*

*

Ji deryayê hez bike, lê li peravê raweste.

*George Herbert*

Çiya baranê dixwaze, wê derya çi bike ji baranê?

*Antonio Fogazzaro*

*

Baş e ku em weke dewlet hînî fikirandinê bûn.

*Roosevelt*

*

Ji berdêla bûyîna serekdewlet, ez bûyîna li ser heqiyê tercîh dikim.

*Henry Clay*

*

Mirovên biaqil hemû hêkên xwe naxin selikekê.

*Cervantes*

*

Masiyên biçûk divê li nêzîkî peravê rawestin.

*Franklin*

*

Ji rûyê bizmarekî nalek, ji rûyê nalekî hespek, ji rûyê hespekî jî siwarek diçe.

*Franklin*

*

Ziman avahiyek ku her kes kevirekî datîne ser e.

*Emerson*

*

Deynkirin ne zêde ji parsekiyê bi ferq e.

*Lessing*

*

Ji berdêla ku mirov ê împaratorekî mirî be, mirov parsekekî li jiyanê be çêtir e.

*La Fontain*

*

Zarok serweta feqîran e.

*Thomas Fuller*

*

Hindikahî kane neheq be, lê piranî hertim neheq e.

*Ibsen*

*

Her tişt tê guhertin, lê tu tişt winda nabe.

*Ovidius*

*

Her tişt diherike.

*Heraklitos*

*

Ji guhertinê pêve her tiş tê guhertin.

*Zangwill*

*

Em her roj tên guhertin; wê raman û afirandinên me çawan weke xwe bimînin?

*Carlyle*

*

Kêmasiyên demokrasiyê, dîsan bi demokrasiyê ji navê radibe.

*Alfred E. Smith*

*

Demokrasî îdara gel, ji aliyê gel, ji bo gel e.

*Lincoln*

*

Ji Xwedê pêve keyê deryayê tuneye.

*Rossetti*

*

Yên bixwazin hînî duan bibin, bila têkevin deryayê.

*George Herbert*

*

Cesaret mirov dajo buhuştê, tirs jî mirov dajo mirinê.

*Senece*

*

Kî xwîna merivekî birijîne, wê xwîna wî jî ji aliyê wî merivfî ve bête rijandin.

*Incil*

*

Karkerekî li ser lingan, ji begekî rûniştî gelekî çêtir e.

*Franklin*

*

Xebat ne bi tenê jiyana mirov bi dest mirov dixe, herweha jiyanê jî bi dest mirov dixe.

*H. Ford*

*

Xebat karê herî bi rûmet e.

*Carlyle*

*

Divê gul xweş bêhn bidin, jin jî biaqil bin.

*Victor Hugo*

*

Yên ku ji zarokan hez dikin, ji jiyanê jî hez dikin.

*Dostoyevskî*

*

Riya herî baş ya başkirina zarokan, anîna kêfa wan e.

*Oscar Wilde*

*

Bavê ku zarokên xwe nas dike, bavekî biaqil e.

*Shakespeare*

*

Peyayên hem mezin, hem jî baş kêm in.

*Thomas Fuller*

*

Li dinyayê tu kîn û nefret weke kîn û nefreta nezanan ya li dijî ilim tuneye.

*G. Galilei*

*

Dojeha di hundirê me de ya ku xeman bi me dide kişandin ne guh dibihîze, ne jî ziman dikane bibêje.

*Lord Byron*

*

Ji bo bidestxistina buhuşta ezmên, ez ê dinyayê li

xwe bikim dojeh.

*Lord Byron*

*

Buhuşt di bin lingên dayikan de ye.

*Hz. Muhammed*

*

Buhuşt, bi Xwedê re yekbûn e.

*Konfuçyus*

*

Cesaret di ser hemû çekan re ye.

*Ovidius*

*

Xwedê alîkarê mêrxasan e.

*Schiller*

*

Heta ku mirov nekeve talûkeyan, mirov bi mêrxasiya xwe nizane.

*La Rochefoucauld*

Pîvana cesaretê ne mirin e, jiyan e.

*Alfleri*

*

Kesên mêrxas dikarin li her welatî ji xwe re starekê peyda bikin.

*Ovidius*

*

An em ê hemû bi hev re bêne bidardekirin, an jî em ê wan yek bi yek bi dar de bikin.

*Franklin*

*

Ji deyndayinê zehmettir tiştek heye, ew jî deynkirin e.

*Braccio*

*

Deyn feqîriya herî xerab e.

*M. G. Lichtwer*

*

Ne bi deyn bide ne jî deynan bike, an na tu ê hem perê xwe hem jî hevalê xwe winda bikî.

*Shakespeare*

*

Deyn deryayeke bêbinî ye.

*Carlyle*

*

Rojek îro bi du rojên sibe ye.

*Franklin*

*

Burokrasî, koviya demokrasiyê ye.

*A. H. Glasow*

*

Mezin, ji ber ku me ew hilgirtine mezin in; ger em wan ji ser piştên xwe bavêjin, ew ê li erdê bi çarpiyan herin.

*Montandre*

*

Ma hûn dizanin ji bo çi yên mezin mizin in? Ji ber ku em li ser jûniyan in. Divê êdî em rabin!

*Stirner*

*

Peyayên mezin ew in, ku guh nadin mezinahiya xwe.

*Shakespeare*

*

Hinek mezin tên dinyayê, hinek mezintiyê bi dest dixin, mezintî jî li hinekan tê.

*M. Aurelius*

*

Cihê ku zelaltî, başî û rastî lê tunebe, mezinahî jî lê peyda nabe.

*Tolstoy*

*

Zanîn dikane mirov têxe ser rêne çewt, lê bersiva vê zanebûneke hê çêtir û hê bêtir e.

*Asimov*

*

Hin mirov hene bi zirecêba gerdûnê dizanin, lê xwe nas nakin.

*La Fontaine*

*

Hemû tiştên ez dizanim, bi tiştekî nizanîbûna min e.

*Sokrates*

*

Hesin bi hesin, zana jî bi zana dizane.

*Talmud*

*

Her peyakî mezin ne peyakî zane, her peyakî zane jî ne peyakî mezin e.

*Holmes*

*

Ilim malê hemû cîhanê ye, tixûbên welatan nas nake.

*Goethe*

*

Yê ku dîrokê çêdikin kes in.

*Carlyle*

*

Qîmeta netewakê, bi qîmeta kesên ku ew netewe anîne meydanê ve, tête pîvan.

*John Stuart-Mill*

*

Gava yên xerab bibin yek, divê yên baş jî werin ba hev, an na ew ê yek bi yek winda bibin.

*Burke*

*

Em hemû ji bo yekî, yek jî ji bo hemûyî.

*Dumas*

*

Bi carekê ve dest bi karekî neke; baş bifikire. Ger nexweşiyek dest pê bike, tu hemû dermanên dinyayê jî bînî fêde nake.

*Ovidius*

*

Dawîanîna baş ji destpêkirina baş çêtir e.

*ovidius*

*

Destpêkirin, nîvdawîanîn e.

*Horatius*

*

Em ji her kesên ku me diecibînin hez dikin, lê em ji her kesên ku em diecibînin hez nakin.

*La Rochefoucauld*

*

Ger hûn dixwazin bila her kes bi başî behsa we bikin, wê çaxê hûn behsa xwe mekin.

*Pascal*

*

Her tim hinin din mînak bidin.

*D.Carnegie*

*

Ji berdêla tu ê hin tiştan nîvî bizanibî, bi tiştekî nizanibe çêtir e.

*Nietzshe*

*

Em nizanin em ê bi çi bin, lê em dizanin em çi ne.

*Shakespeare*

*

Yên ku zanebûna wan zêde dibe, derdên wan jî zêde dibin.

*Încîl*

*

Yên ku hinin din bizanibin zane ne, yên ku xwe jî bizanibin biaqil in.

*Lao-Tsze*

*

Ma qet zane û nezan dibin yek?

*Hz.Muhammed*

*

Zanebûn gencîneyeke ku bi paş ve nayê stendin e.

*Menandes*

*

Ma hûn dizanin bavên herî nebaş kî ne? Ewên ku kirinên xwe yên xortaniyê ji bîr kirine.

*Diderot*

*

Bavek beramberî sed mamostan e.

*George Herbert*

*

Yên ku em ji wan hez dikin, gava me dixapînin em wan efû dikin, lê yên ku hindiktir bêne efûkirin ew in.

*Bismarc*

*

Efûkirina dijminekî, ji efûkirina dostekî hêsantir e.

*Dorothee Deluzy*

*

Riya parastina aştiyê ya herî baş, ji şer re amadebûn e.

*Washington*

*

Aştiya herî nebaş jî ji şerê biheq çêtir e.

*Cicero*

*

Ji berdêla îdarekirina hukûmeteke bêî rojname, ez îdarekirina rojnameyeke bêî hukûmet tercîh dikim.

*Jefferson*

*

Sê rojname min ji sed alan bêtir ditirsînin.

*Napoleon*

*

Di jiyanê de bidestxistina serketina herî mezin, têgihîştina çend rastiyan û jiholêrakirina çend şaşiyan e.

*Fredrickê Mezin*

*

Di dinyayê de du riyên biserketinê hene: Yek jê ji aqilê xwe, ya din jî ji bêaqiliya xelkê fêdedîtin e.

*La Bruyere*

*

Ku evîn tê aqil diçe.

*Antoine Bret*

*

Xwesteka xortan; evîn, pere, xweşî. Xwesteka kal û pîran; xweşî, pere, evîn.

*Paul Geraldy*

*

Evîn dilxweşiyeke dewamî ye.

*George Sand*

*

Evîn mêrdewaneke ji êgir e, ku ji dil dirêjî asman dibe.

*E. Geibel*

*

Evîn weke mirinê bi hêz, weke gorê dexes e.

*Încîl*

*

Evîn kevneçîrokek e, ku dikare nikenû bimîne.

*H. Heine*

*

Were di dilê min de bijî, ez tu kirê ji te nastînim.

*Samuel Lover*

*

Evîn li Fransa komedî, li Îngiltereyê trajedî, li Îtalyayê opera, li Almanyayê jî melodramek e.

*Marguerite Blessington*

*

Evîndarê şermok, dibe mêrekî dilxerab.

*Oliver Goldsmith*

*

Dildarê ku ne destvekirî be ne tu dildar e.

*Thomas Hardy*

*

Bingeha jiyanê agir e.

*Heraklites*

*

Karê em pêşî bikin, divê em hemû avûkatan bikujin.

*Shakespeare*

*

Adet e; yê ku bav dide hev, law belav dike.

*Goethe*

*

Hevalê xwe ji min re bibêje, ez ê ji te re bibêjim bê tu kî ye.

*Cervantec*

*

Hevaltî mîna petêxan e. Ger hûn bibêjin çima? Ji ber ku heta mirov yekî baş dibîne, mirov bi sedan dipelîne.

*Claude Mermet*

*

Her tiştên te yên min, her tiştên min jî yên te ne.

*Plautus*

*

Dê û bav bi tesadufî, hevaltî jî bi neqandinê peyda dibin.

*Delilie*

*

Sê dostên rast hene. Pîrejinek, segekî pîr û perên hazir.

*Franklin*

*

Riya herî baş ya ku hûn hevalên xwe winda nekin ev e, ne bi deyn bidin, ne jî deynan bikin.

*Paul de Kock*

*

Hevaltî şeraba jiyanê ye.

*Young*

*

Jin jî mîna qiralan in, tu carî nikanin bi kesî re bibin heval.

*Lord Lyttleton*

*

Generalê ku herî hindik şaşiyan dike, ew generalê herî mezin e.

*Napoleon*

*

Şêr jî dikane bibe deyndarê mişk.

*Thomas Fuller*

*

Têgihîştina mirovekî çiqas hindik be, ew mirov ewçend ji xwe razî ye.

*Kotzebue*

*

Buhuşt di bin lingên dayikan de ye.

*Hz.Muhammed*

*

Jin bêhêz in, lê dayik bihêz in. Dayik bêdawiya jiyanê ne.

*Emile Zola*

*

Dilê dayikê, dibistana zarokê ye.

*Henry Ward Beecher*

*

Mirov dikane bi dînîtî bijî, lê nikane bi dînîtî bimire.

*Young*

*

Talûka herî mezin di navbera kêmaqil û nîvbiaqilan de ye.

*Goethe*

*

Yên ku dixwazin xwe di nava bêaqilan de biaqil nîşan bidin, ew di nava biaqilan de bêaqil dixuyin.

*Quintilian*

*

Ji xortan weye ku kal û pîr bêaqil in, lê kal û pîr dizanin ku xort bêaqil in.

*George Chapman*

*

Merivên nefsbiçûk qet behsa xwe nakin.

*La Bruyer*

*

Bizanibe cihê xwe bide yên ji xwe çêtir.

*Terence*

*

Gava mirov bi serketinên mezin bêaqil nebe, mirov nefsbiçûk dibe.

*Alain*

*

Ger mirovan hevdu nexapandina, nikanîbûn demeke wilo dirêj bi hev re bijiyana.

*La Rochefoucauld*

*

Çepik mafê wî kesî ye ku çepik hindik jê re lêdikevin.

*Emerson*

*

Mîrasa herî baş ya ku dê û bav ji zarokên xwe re bihêle, ew çend deqîqeyên wan yên rojane ne.

*Battista*

*

Ger hûn pirsa xwendina min ya pirtûka herî baş bikin, ez ê ji we re bibêjim: Dayika min e.

*Lincoln*

*

Nîvê jiyana meriv ji aliyê dê û bavan, nîvê din jî ji aliyê zarokan ve mehû dibe.

*Claerense S. Darrow*

*

Divê bîranînên me yên kevin bibin hêviyên me yên nû.

*Arsene Houssaye*

*

Bîranîn buhuşta yekem e ku nayê qewirandin.

*J. P. Richter*

*

Hunera bi bîranînê, hunera balkêşiyê ye.

*Samuîl Johnson*

*

Ne kevir, lê kirinên mirov hêkelan tînin meydanê.

*Motley*

*

Ne gava em dimirin, lê gava ku em çêdibin giriyê me nebêsebeb e.

*T. B. Aldrich*

*

Malbat kelehek wilo ye ku qiral jî nikarin têkevinê.

*Emerson*

*

Tu ferqên mezin di navbera îdarekirina malbatekê û ya qiraliyetekê de tune ne.

*Montaigne*

*

Her malbat dîrokek e, ji yê ku zane bixwîne re, destanek e.

*A. de Lamartine*

*

Di her malbatê de melek jî hene, şeytan jî hene.

*Joseph Roux*

*

Di xortaniyê û spehîbûnê de li êqil megere.

*Homeros*

*

Bêaqil ji biaqilan hindik tiştan hîn dibin, lê biaqil ji bêaqilan pir tiştan hîn dibin.

*Cato*

*

Aqilek baş e, du aqil baştir in.

*A. Çexov*

*

Kêmaqilî bi du celeban dibe: Yek jê ji dinîtî, ya din jî ji nezanî ye.

*Eflatun*

*

Mirov mezinahiya peyakî di nefsbiçûkahiya wî de dibîne.

*John Ruskin*

*

Roj bi birçiyan dirêj tên.

*Aleksis Kivi*

*

Neheqiya ku li yekî bi tenê dibe, ji civatê gişî re tehdîtek e.

*Montesquieu*

*

Gul çi ye? Ma navê wê tiştekî din ba jî qey wê evqasî ne bêhnxweş bûya?

*Shakespeare*

*

Navê ku tu ji lawê xwe re bihêlî, bila bavê te fedîkar dernexe.

*Baraccio*

*

Jinek her tiştî efû dike, bi tenê redkirina xwe efû nake.

*Alfred de Musset*

*

Efûkirin yê bi hêz bihêztir dike.

*Publilius Syrus*

*

Efûkirin zekata biserketinê ye.

*Hz. Emer*

*

Her dar ji mêwa xwe tê zanîn.

*Încîl*

*

Darên ku dereng digihên darên herî bi ber in.

*Moliere*

*

Yê ku xwe bispêre dareke baş bêî sî namîne.

*George Harbert*

*

Xemkişandin ji mirinê bêtir cesaretê dixwaze.

*Napoleon*

*

Ger nan hebe her xem tê kişandin.

*Cervantes*

*

Xorto wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirîcar, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilînî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye.

*Celadet Alî Bedir-Xan*

*

Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê têne daqurtandin. Ko gihane hev dibin lehî, lehîke boş. Tu kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata welatê me di rabûna vê lehiyê de ye.

*Celadet Alî Bedir-Xan*

*

Ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm.

*Seîdê Norsî yê Kurdî*

# ÇEND GOTIN

Di destpêka sala 1980 de min ê li ser huner û edebiyatê ji bo kovara Berbangê nivîsek binivîsanda. Ez hingî ji bo nivîsa xwe li aforîsmayekê geriyabûm, min gelek pirtûk û kovar tev dabûn, lê min aforîsmayeke li gorî dilê xwe û li gorî nivîsa xwe nedîtibû. Piştî bi demekê, li pirtûkxanê pirtûkeke biçûk ya aforîsma li ber çavên min ketibû. Ez li quncikeke pirtûkxanê ya xalî û bêdeng li ser qoltixekê rûniştibûm û min çavek lê gerandibû. Digel ku çend salên min li Swêd çêbûbûn jî, têgihîştina wan aforîsmayan ji min re ne ewçend hêsan bûn. Lê bi alîkariya ferhengan min ji wê pirtûkê bi qasî deh-panzdeh aforîsma wergerandin kurdî. Piştî bi demekê min hinin din jî lê zêde kirin û min di bin navê "Peyvên Nivîskarên Naskirî" de di kovara Berbangê de dane weşandin. Piştî weşandinê bi kurtedemekê rojekê ji min re ji Swîsreyê nameyek hat. Name ji Nûredîn Zaza bû. Wî ew aforîsma xwendibûn û gelekî kêfa xwe jê re anîbû. Herweha di bîra min de anîbû ku wî jî di dema xwe de di kovara Hawarê de ji R. Kipling û hwd. werger kiribûn.

Mîna ku ew gotinên Nûredîn Zaza ji min re bûbûn çavkaniya îlhamê û hêvî dabû min. Piştî wê nameyê min li ku aforîsmek dît, min wergerand. Rojekê min hemû bi deqtîlo nivîsandin, min dît ku bi têra pirtûkekê çêbûne.

Çîroka vê pirtûka di destên we de û serpêhatiya berhevkirin û wergerandina van "gotinan" bi kurtî ev e. Lê belê, digel gotinên gelekî bi mane pir gotinên bêmane jî hene. Ji xwe nayê wê maneyê ku hemû "aforîsma" rast in û divê mirov li dû wan biçe. Lê, mirov dikane ji wan fêrî gelek tiştan bibe û bi alîkariya wan asoya xwe ya fikrê firehtir bike.

**Firat Ceweri**

# GOTINÊN NAVDARAN

## Amadekar: Firat Cewerî

Xorto wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirîcar, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilînî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye.

*Celadet Alî Bedir-Xan*

Yên ku ne azad bin û mîna ku azad in xwe nîşan bidin, ew koleyên herî mezin in.

*Goethe*

Maleke bê pirtûk mîna laşekî bê ruh e.

*Cicero*

Ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm.

*Seîdê Norsî yê Kurdî*